

Ji bo
Dayik yan bav yan welîyê şagirdî yê klasa 6ê
li dibistana bingehî [grundskolanê] û dibistana samîyan [sameskolanê]
yan yê klasa 7ê li dibistana taybetî

Îmtîhanên giştî (yên neteweyî)

Silav!

Ev name ji te re hatiye çunkî tu dayik yan bav yan welîyê şagirdêkî yî ku dê di vê sala xwendinê de îmtîhanên giştî di madeyên zimanê îngilîzî, matematîk, zimanê swêdî û swêdî wek zimanê duyê de bike.

Çima şagird dê îmtîhanên giştî bikin?

Şagirdên klasa 6ê ya dibistana bingehî û dibistana samîyan û ya klasa 7ê ya dibistana taybetî dê îmtîhanên giştî bikin. Ev îmtîhan dê ji bo nirxandineka hevqîmet û adil ya zanîna şagirdan alîkar bin. Ev îmtîhan dê ji bo nirxandin û derecedayîna zanîna şagirdî li gor şertên bidestxistina zanyarîyan yên xwedî gaven derecekirî ku di plana kursan de hene alîkarîya mamostayan bikin.

Daîreya Giştî ya Dibistanan wezîfeyê dide çend zanîngehên welatî ku îmtîhanan hazir û amade bikin. Pîrsên îmtîhanan li gelek dibistanên cuda li seranserî welatî hatine ceribandin. Heqê şagird û mamostayan hebû ku dîtinên xwe bidin û ew li ber çav hatine wergirtin gava îmtîhan hatiye hazir kirin.

Plankirina kursan yên madeyên cuda dibe bingeh gava biryar li ser naverok û hazirkirina îmtîhanan tê dan. Lê ne mimkin e ku her tişt yê ku di plana kursê madeyekê de heye tevî îmtîhanê bibe. Çunkî îmtîhaneka weha dê bêhed mezin bibe.

Awayekê xebatê yê mieyen yan hin alavên alîkar yên xwendinê yên taybetî ji bo îmtîhanên giştî nabin bingeh. Di îmtîhanên giştî de, îmkan ji şagird re tê dan ku bi çend awayên cuda zanîna xwe nîşan bide.

Kengî îmtîhan dê bîn kirin?

Îmtîhanên giştî ji çend qimsên cuda pêk tên. Qismên îmtîhanan yên devkî dê di demsala xwendinê ya payîzê de di hefteyên 45-50 de bîn kirin. Dibistan biryarê dide ka şagird dê kîjan wextî wan îmtîhanan bikin. Qismên îmtîhanan yên nivîskî dê di demên diyarkirî de yên ku Daîreya Dibistanan ya Giştî biryarê dide di demsala xwendinê ya biharê de bîn kirin. Îmtîhan îlzamî ne.

Çawa îmtîhanên nîrxandin?

Agahdarîyên hûrik hene ku divê mamosta di nîrxandina îmtîhanên giştî de li dû here. Di demên paştir de, gava mamosta nîrxandineka giştî ya zanîna şagirdêkî di madeyekê de dike, ew di dema derecedayîne de netîceya îmtîhanên giştî jî li ber çavan digire.

Civandina netîceyan

Daîreya Giştî ya Dibistanan bi hevkarîya Ofîsa navendî ya statistîkê [Statistiska centralbyrån (SCB)] neteweyên îmtîhanên giştî dicivîne. Civandina netîceyan îmtîhanan ji bo nirxandinê ya ku dibistan bikin lê dîsa ji bo tehlîlên netîceyan li welatî û li belediyeyan û ji bo berpirsiyarên dibistanên xweser jî pêwîst e.

Matematîk

Îmtîhana giştî ya matematîkê ji qismên cuda pêk tê ku tê de pirsên nivîskî yên ku şagird bi ferdî bersiv didin û pirsên devkî yên ku şagird di komên biçûk de bersiv didin hene. Hem di pirsên nivîskî hem jî yên devkî de, îmkan ji şagirdan re tê dan nîşan bidin ku ew dikarin îzah bikin û delîlan bidin ka ew çawa bi rêya matematîkê difikirin.

Zimanê swêdî û swêdî wek zimanê duyê

Îmtîhana giştî ji bo her du madeyan zimanê swêdî mişterek e û ji çend qisman pêk tên. Tê de pirs hene ku şagird bi ferdî û di komê de bersiv didin. Bi rêya wan her du awayên pirsîwaran, îmkan ji bo şagirdan heye ku zanîna xwe di warên axaftin, sihetkirin, xwendin û nivîsandinê de nîşan bidin.

Îngilîzî

Îmtîhana giştî ya zimanê îngilîzî ji gelek qisman pêk tê. Bi rêya pirsên cuda yên îmtîhanê, îmkan ji şagirdan re heye ku qabiliyeta xwe ya bikaranîna zimanê îngilîzî di axaftin û nivîsandinê de û qabiliyeta xwe ya fehmkirina wî zimanê yê ku dibhîzin û dixwînin nîşan bidin.

Agahdarîyên zêdetir li kûderê hene?

Agahdarîyên zêdetir li ser madeyan îmtîhanên giştî di malpera Daîreya dibistanan [Skolverketê] de hene

www.skolverket.se/bedomning

Li wê derê link jî ji bo mînakên hin pirsîwaran îmtîhanan hene.

Peywendîyê bi Daîreya dibistanan bike

nationellaprov@skolverket.se